

BUROYA KURDÎ

ya Pêwendî û Agahdariyê

Bultena agahdariyê N° 91 - Teşrîn 2012
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tel. 02 219 80 60 www.kurdishbureau.be
kurdishbureau@scarlet.be

XEBATA BUROYA KURDÎ

ÇIRÎ 2012

KONFÊRANS

07.10.2012 : *Rewşa siyasî ya Kurdistanê di şerrê cihanê yê yekemîn de (4)*



Wezîrê Eşo, dîrokzan, dûmahiya (dewam) şerrê cihanê yê 1mîn li ser axên li dora Kurdistanê û li Kurdistanê bixwe jî got.

Heta 1917, leşkerên Rûsya ku Erzurum, Erzincan, Trabzon û Wanê, li Kurdistanê Tirkîyê, û tevayîya Kurdistanê Îranê dagir (işgal) kiri bûn û gihajti bûn heta Rewanduzê, li Kurdistanê Iraqê. Her ku Rûsan kar dikir û diketin kûrayîya axa Kurdistanê, her ku siwariya kurdî "Hamidiyye" (ku sultanê tirk Abdulhamid ava kiri bû), ku Tirkîyê diparast, ji şerr derdiket. Bi ser de jî, Kurdan serhildanên navçeyî li dijî Tirkîyê pêk dianîn. Pîrsa pêşeroja Kurdistanê ji bo Rûsya û dewletên hevalbend "Entente" (hevalbendên ewropî ku şerrê Imperatoriya Osmanî dikir) gelek rojane (aktuel) bû bû. Wan dest bi dîtina çareyên dîplomatîk, ramyariyî (siyasî) û leşkerî kir, ji bo ku Imperatoriya Osmanî û Îrana ku helwesta wê di navbera her du aliyan de bêalî bû, perçe bikin û di nav xwe de, bi temamî û dayîmî,

par bikin. Di 1916 de, Peymana Sayks-Picot hat wajo (imza) kirin. Li gora vê peymanê, zonên (herêmên) dagirkirinê hatin nîşan dan : Fransa ewê Kurdistanê Iraqê û beşek ji Kurdistanê Tirkîyê bîstenda. Rûsya ewê beşa mayîn a Kurdistanê Tirkîyê û Ermenistana Rojava bîstenda. Ingilîz ewê beşek ji Kurdistanê Iraqê, ji Kerkûkê ber bi Başûr û beşa Başûrê-Rojava ya Kurdistanê Îranê bîstenda. Beşa mayîn a Kurdistanê Îranê keti bû nav zona rûsî.

Hilweşana nêzik û dayimî ya Imperatoriya Osmanî û dagirkirina "de facto" ya Îranê ji aliyê Ingilîz û Rûsan derî li ber azadbûn û yekbûna hemî axên kurdî di nav dewleteke serbixwe de venedikir. Bi ser de jî, ev yek bû bû sedema tîrsa (tehlîke) bêtir û ji bo demeke dirêj perçekirina axên kurdî .

ROJA DYALOGÊ



Di 20 Çirî 2012 de, weka her sal, rêxistina Foyer niv-rojêke dyaloga "intercultural" pêk anî. Rêxistinên cihê maseyên dyalogê li şaredariyên cihê yên Bruksêlê vedikin û kesên ji çandên cihê beşdarî wan dibin. Li ma-

seya Buroya Kurdî sê Kurd, yek Îtalî, yek Hollandî-Swêdî, 3 Beljîkî, yek Fransî û yek Uzbêk hebûn. Bi tevayî, 10 kes, ku ji wan 5 jin. Lina d'Amico, ji riha (asl) îtalî, mase bi rê ve bir. Buroya Kurdî kesên din şandin maseyên ku li şaredariyên Molenbeek, Etterbeek û Ixelles hatin vekirin.

DYALOGA "INTERCULTUREL" DI NAVBERA CUHANAN DE

31.10.2012, di çarçeva projeya Buroya Kurdî ya bi navê « Interculturele Dialog tussen Jongeren » (Dyaloga Interculturel di navbera Cuhanan de) de, bi şirkatiya Internationaal Comité û rêxistinên cuhanan, D'Broei û Chiro (ewê ev proje bi kurtî di vê bultenê de di destpêka 2012 de bê ravekirin), 10 cuhanên ji çandên cihê û ku li şaredariyên cihê dimînin li Buroya Kurdî civiyan, ji bo ku hevdu nas bikin û çalakîyên ku dixwazin bikin bêjin : 5 Kurd, ku ji wan keçek ; 1 Kurd-Tirk, 1 Tirk, 1 Cezairî, 1 Kongolî û 1 Marokî. Ew li şaredariyên cihê dijîn : Sint-Joost, Evere, Elsene, Schaerbeek, Brussel navend, Woluwé Saint-Pierre, Haren, Vilvoorde û Turnhout.

Ev rasthatin bi amadebûna dêyek û bavekî, 2 çalakvanên (animateur) ku projê ci cî tînin (yek Kurd û yek Tûnisî) û 2 berpirsiyarên Buroya Kurdî û Internationaal Comité bû.

HEVPEYVÎN

Bi hinceta sersaliya xwe ya 15mîn, « Service d'Interprtétariat Social » (Servîsa wergerandina « tercume » Civakî) ya rêxistina Bruxelles-Accueil (li jêr

binêre), hevpeyvînek bi Zaralî Nikraweş re, ku wergêrê sondxwarî, endamê Buroya Kurdî û hevkarê vê Servîsa Civakî ye, kir û ev hevpeyvîn di dosyeke taybetî (xusûsî) de hat weşandin. Nikraweş bi têtêfonê û carna li ciyan gelek wergerandin (di navbera 200 û 350 car di salê de), bi kurdî û farisî, ji bo penaberên kurd, îranî û afxanî, dike.

BEŞDARBÛNA ÇALAKIYÊN RÊXISTINÊN DIN

01.10.2012 : *Servîsa Wergerandina Civakî ya rêxistina Bruxelles-Accueil* : Pîrozkirina sersaliya xwe ya 15mîn li şanoya Beursschouwburg.

13.10.2012 : *Pax-Christi Wallonie-Bruxelles : Konfêrans* : Gelo beharên erebî alîkariya ketina Tirkiyê nav Yekîtiya Ewropa dikin ?

Diviya bû ku Prof. Robert Anciaux tê de bipeyive, lê ji bo ku ew nexweş bû, Nicolas Bardos, serokê encumena Ewropa ya vê rêxistinê, vê babeta ku di rojevê de ye ravekir.

16.10.2012 : *Service Protestant d'Education Permanente : Konfêrans* : Sûriye, Rojhilata Navîn, hevsiyên (cîran) Ewropa. Gelo Yekîtiya Ewropî dikare kîjan siyasetê bajo ?

Pekka Hakala, şirovekarê (analyste) siyasî li Parlemanta Ewropî û polîtologê pisporê Rojhilata Navîn, tê de peyivî.

NÛÇE JI KURDISTANÊ

ÇIRÎ 2012

KURDISTANA TIRKIYÊ

PIRSA ZIMANÊ KURDÎ

Zimanê kurdî li kongreya partiya desthilatê « AKP »ê Di 31 Îlon 2012 de, li kongreya 4mîn a partiya desthilatê, AKPê, daxuyaniyeke nivîskî, bi awayê broşurê, bi navê « Vîzyona 2023 », hat weşandin. Ew ji 63 xalên ku hin ji wan rasterast li ser baştirkirina jiyana ramiyariyê (siyasî), civakî û çandî yan Kurdan in pêk hatiye. Eger ev xal, nemaze yên li ser xweparastina bi kurdî li dadgehan û bikaranîna vî zimanî di servîsên hukûmî de, bên bi cî anîn, ewê Tirkiye karibe hêdî hêdî ber bi duzimanî pêş ve biçê.

(netkurd.com, 01.01.2012)

Kurdî zimanekî biyanî ye !

Birêvebiriya Giştî ya Agahdariya li ser Weşan û Çapemeniyê, ku girêdayî serokwezîrê tirk e, di daxuyaniyekê de got ku zimanê kurdî zimanekî biyanî ye û ku dîtina kesên ku karibin pê karê xwe bikin zor e.

Kurdî, weka farisî, ermenî, suryanî, erebî, inglizî, fransî û rûsî, zimanekî biyanî tê hesab kirin. Lê ew zimanê tenê ye ku jê re tê gotin ku zor e ku meriv pê kar bike (zor e ku meriv pêsonêlê ku karibe wî bi kar bîne) ! Parlementerê dijberiyê (muxalefet) yê partiya CHPê, Turgut Dibek, li ser vê yekê pirseke parlementerî, ji cîgirê serokwezîrê tirk, Bülent Arınç, kir.

(avestakurd.net, 12.10.2012)

Wezareta perwerdeya neteweyî pirtûkeke dibistanî ya zimanê kurdî diweşîne



Wezîrê perwerdeya neteweyî pirtûkeke hînkirina zimanê kurdî, bi navê « Kurdî 5 Kurmancî » û « Kurdî 5 Zazakî » weşand. Tê de 148 rûpel hene, ji bo polên (klas, sîmf) 5mîn ên dibistanên seretayî (yên destpêkê, ilk okul, ibtidai) ye û ji aliyê 5 pisporan hatiye amade kirin. Li ser bergê (qalîk), fotoya du zarokan û straneke kurdî « Bi xeml û rewş e, şêrîn û xweş e zimanê kurdî » hene. Li rûpela pêşîn al û sirûda neteweyî yê tirkî, li rûpela 2mîn Banga Ata-Türk ji Cuhanan re û rûpela 3mîn fotoyeke mezzin a Ata-Türk hene !

(netkurd.com, avestakurd.net, rudaw.net, 19.10.2012)

WEZÎRÊ KARÊN DERVE PÊŞWAZIYA SEROK BERZANÎ DIKE

Di 01 Çirî 2012 de, wezîrê tirk ê karên derve, Ahmet Davutoğlu, pêşwaziya serokê Kurdistanê Iraqê, Mesûd Berzanî, piştî kongreya partiya xwe ku Berzanî beşdarî wê bû bû û ku tê de bi kurdî peyivî bû (li bultena me ya buhurî, N° 90, binêre), kir. Piştê, her du konfêranseke çapemeniyê ya hevrayî pêk anî û tê de li ser pêwendiyên xwe yê dualiyî û pêwîstiya pêşdebirina wan ber bi asteke (sewiye) bilindtir peyivîn.

(netkurd.com, 01.10.2012)

ŞERR LI NAVÇEYÊN SÎVÎL

Colemêrg

Di 02 Çirî 2012 de, leşkerê tirkî tevgereke fireh li Geniştepe, li nêzikî Şemzînanê, li navçeya Colemêrgê (Hakkari), li Kurdistanê Tirkîyê, dest pê kir. Di vê tevgere de, pevçûnên bi çekdarên PKKê (HPG : Hêzên Parastina Gel) re bûn. 4 serbaz (esker) hatin kuştin û gelek birîndar bûn. Firokeyên tirkî navçe bombe kir.

(avestakurd.net, 02.10.2012)

Piştî zêdebûna pevçûnan, serleşkeriya tirkî ji sîvîlan re qedexa kir ku li 15 ciyên Kurdistanê Tirkîyê, ji 07 Çirî 2012 heta 07 Teşrîn 2013, bigerrin. Ji van cayan, çiyayên Cûdî, Kato, Pîran û Diclê. Fermanên weha her sal, dema ku şerr xurt dibe, ji sîvîlan re tînin dayîn.

(peyamner.com, 05.10.2012)

Di 16 Çirî de, li Çelê, cardin li navçeya Colemêrgê, PKKê di heman (eynî) zamanî de êrîşî du bingehên

jandarman kir. 4 serbaz û 3 PKK hatin kuştin. Li Geverê, bombeyek teqiya. 2 zarok birîndar bûn.

(rudaw.net, peyamner.com, 17.10.2012)

Îdir

Di 10 Çirî de, HPG êrîşî karwaneke leşkerî ya tirkî kir. 10 serbaz mirin.

(avestakurd.net, 10.10.2012)

(Şirnex (Şirnak))

Di 12 Çirî de, şervanên PKKê, ku çavdêriya (kontrol) riyêke gundê Germavê, li qezayê Elkê, li nêzikî Şirnexê, dikir, du kes bin çav kirin. Yek ji wan parêzerê gund (mîlîs) û yek jî mamosteyeke jin in.

(rudaw.net, 13.10.2012)

SEROKÊ TIRK Î PARLEMENTERÊN KURD ÊN GIRTÎ

Li ser ragirtina parlementerên kurd (li bultenên me yê buhurî binêre), serokê tirk Abdullah Gül li parlemantê axaftineke ku ji yê ramiyarên (siyasî) din ên tirk cihê ye kir. Wî got ku ev parlementer ji aliyê xelkê hatine hilbijartin û ku divê ku cihê wan li parlemantê be. Û wî got jî ku heta ku dadgeh biryara xwe li ser çarenûsa (qeder) wan bistîne, divê ku ew karê xwe li parlemantê bajon (dewam bikin).

Serokwezîrê tirk, Recep Tayyip Erdoğan, ev axaftin ne pejirand (qebûl ne kir) û got ku ji xwe dema ku ev parlementer hati bûn hilbijartin, ew li zîndanê bûn.

(avestakurd.net, 02.10.2012)

ŞARE DARÊ DIYARBEKIRÊ MALA XWE DIFIROŞE

Şaredarê kurd ê Diyarbekirê, Osman Baydemir, neçar (mecbûr) e ku mala xwe ku bi krêdî kirrî bû bifiroşe, ji bo ku karibe ceza bide dadgehê. Piştî gazîneke serokwezîrê tirk, Recep Tayyip Erdoğan, dadgehê ferman (emr) da bû wî ku cezayê 50.000 lîreyên tirkî bide. Ev yek, ji bo ku berê salekê, di dema tevgereke fireh li dijî şaredar û berpirsiyarên partiya kurdî BDPê de, Baydemir bi serokwezîr re bi bê edebî peyivî bû.

(Çapemeniya kurdî, 02.10.2012)

PKK DÎLEKÎ AZAD DIKE

Di 04 Çirî 2012 de, PKKê Abdulmecit Tarhan, Kurdekî ku serokê şaxa Colemêrgê (Hakkari) ya partiya tirkî ya desthilatê « AKP » ye, azad kir. Ew di 02 Îlon 2012 de li nêzikî gundekî wê navçê hati bû revandin. Ew li Xazo, li Kurdistanê Iraqê, ji şandeke ku ji serokên rêxistinên cihê yê mafên mirov pêk hat re hat radest (teslîm) kirin.

Ji aliyekî din, dê û bavê serbazekî ku ji aliyê PKKê hati bû revandin, Ramazan Başaran, azadkirina wî di

daxuyaniyeke çapemeniyê de, li avahiya rêxistina Mazlum-Derê, li Diyarbekirê, xwest.
(netkurd.com, 05.10.2012)

RAPPORA KOMMISYONA EWROPÎ

Rappora sala 2012 a Kommisyona Ewropî li ser Tirkîyê derket. Ew tê de dibêje ku giftûbêjeke mezzin li ser pirsra kurdî bû, lê ku di vî warî de pêşveçûn ne bû û ku ev pirsra kurdî ji bo dêmokrasîyê li Tirkîyê « key chalenge » (pirsa klît) dimîne. Û ew rewşa zîndankirinan, azadiya ravekirinê, masrafên leşkerî, êşkence û zagona (qanûn) li ser MITê (polisê dîzzî yê tirkî) ... jî rexne dike. Rapporêrîşên PKK jî « têrrorist » bi nav dike.
(rizgari.org, 06.10., rudaw.net, 17.10.2012)

DOZA « KCK »ê (dûmahîk)

Di 06 Çirî 2012 de, rûniştina 59mîn a doza « KCK »ê (Komela Civaka Kurdistan) li Diyarbekirê bû. Parlementerê berê Hatip Dicle xwe tê de bi zimanê kurdî parast û Mehmet Emin Aktar, serokê barroya Diyarbekirê, parastina wî wergerand tirkî. Ji çar salan de, ev cara yekemîn e ku parastinek dikari bû bi kurdî bibe.
(netkurd.com, 07.10.; rizgari.org, 08.10.2012)

BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ (dûmahîk)

Di 06, 07 û 15 Teşrîn de, firokeyên tirkî Kurdistanê Iraqê, ji bo lidûketina PKKê, bombe kir. Di 20 salên dawîn de, ev bombekirin 73 Kurdên Iraqê kuştin û 90 birîndar kirin. Bi ser de jî, 112 gund hatin vala kirin.
(*Çapemeniya Kurdî*, 07, 08 û 14.10.2012)

PARLEMENTEREKÎ KURD : EZ JI ATA-TÛRK HEZ NAKIM !

Li civîneke encumena karên hundir a parlamenta Tirkîyê, parlementerê partiya kurdî BDPê, Altan Tan, got : « Herkes ne neçar (meçbûr) e ku ji Ata-Türk hez bike. Hez kirina min ji Ata-Türk re nîn e. Tukes nikare

wî piçûk bike (jê re heqaret bike), lê hez kirina wî tişteki din e. Ez bixwe ji Ata-Türk hez nakim » ! Parlementerê partiya faşîst MHPê bersîva wî da : « Eger hûn ji Ata-Türk hez nekin, çima hûn li parlamentê ne ? ». Wezîrê hundir, Idris Naim Şahin, ji Altan re got : « Ên berê we bi dengê nîzm dipeyivîn ». Altan bersîva wî da : « Ez ne ew kes im ku ji we edeba axaftinê bistîne. Herî qurretiya xwe li derekî din nîşan bidin » !
(netkurd.com, 16.10.2012)

GRÊVA BIRÇÎBÛNÊ YA GIRTIIYAN

Ji 12 Îlon 2012 de, bi sedan girtî grêva birçîbûnê, li zîndanên cihê yên Tirkîyê, dikin. Di destpêkê de, 63 ji wan grêva bêdawî li zîdana Diyarbekirê kir. 225 rêxistinên civaka sîvîl ên Diyarbekirê bi daxuyaniyeke çapemeniyê piştgiriya xwe nîşan da. Bi ser de jî, çend partiyên ramyariyê (siyasî) yên Kurdistana Tirkîyê, Iraq, Îran û Sûriyê jî piştgiriya xwe nîşan da û bal kişandin ku hin girtî dikarin bimirin, eger hukûmeta tirkî di neguhdana daxwaziyan wan de dewam bike. Piştî, ev grêv belav bû bajarên din.

Di 24 Çirî 2012 de, wezîrê dadiyê (edalet), Sadullah Ergin, çû zîdana Sincanê, li Ankara, ji bo ku guhdariya grêvistan bike. Piştî, wî daxuyand ku heta vê mêjuyê (tarîx), 680 girtî li 58 zîndanên grêva birçîbûnê kiriye. Girtiyên siyasî yên PKK û PJAKê (şaxa îranî ya PKKê) rakirina tenhabûnê li ser serokê xwe Abdullah Öcalan, pejirandina (qebûlkirin) mafê xwe ku xwe bi zimanê kurdî biparêzin û naskirina perwerdeya bi kurdî li dibistanan xwestin.

Di 29 Çirî de, berpirsiyarê partiya kurdî BDPê bangî xwepêşandaneke (meşîn) mezzin ji bo piştgiriya girtiyên kir. Li nêzîkî 20 bajarên kurdî jiyan rawestiya. Bazarganan firoşgehên (dîkkan) xwe girtin û zarok ne çûn dibistanê.
(*Çapemeniya Kurdî*, 20-31.10.2012)

KURDISTANA IRAQÊ

WEZÎRÊ PERWERDEYA BILIND LI POLONYA
Wezîrê perwerdeya bilind û lêgerîna zanyariyî (ilmî) yê Kurdistanê, Dr. Elî Seîd Muhammed, çû Polonya. Ev yek bi vexwendina parêzgarên (walî) navçeyên Malopolska û Wielkopolska. Bi hogiriya nimînendeyê (temsîlcî) hukûmeta Kurdistanê Iraqê li Polonya, Ziyad Reûf, wezîr rastî berpirsiyarên fermî (resmî) yên polonî yên cihê hat û bi wan re imkana şandina xwendekarên kurd bo zanîngenên polonî giftûbêj (munaqêşe) kir. Û ew çû seredana çend zanîngehan û muzexaneyekê.
(Krg.polonya, 01.10.2012)

SEREDANÊN ŞANDEYÊN BIYANÎ

Amerîka

Berpirsiyarê karên derve yê Kurdistanê Iraqê, wezîr Fellah Mustafa, li Hewlêrê pêşwaziya şandeke amerîkî ya bazarganiyî kir. Seredan ji aliyê rêxistineke bê amanca maddî, “East West Institute” (Enstituya Rojhilat Rojava), ji bo pêşdebirina pêwendiyên di navbera civakên bazarganiyî “business” li Amerîka û Kurdistanê, hat pêk anîn.

Serokatiya şandê ji aliyê gêngêral James Jones, serokê “Business Council US-Kurdistan”, hat kirin.
(peyamner.com, 01.10.2012)

Di 16 Çirî de, serok Berzanî şandeke bilind a encumena bazarganiyî Amerîka-Kurdistan kir. Wî jê re got ku Kurdistan siyaseteke wê ya deriyê vekirî ji bo berhemanînen (investissements) biyanî, nemaze yên amerîkî, heye.
(peyamner.com, 17.10.2012)

Yekîtiya Ewropî

Encumena Civaka Sîvîl a Parlemeta Kurdistanê Iraqê pêşwaziya şandeke Yekîtiya Ewropî, ku ji birêvebirê bernameya piştgiriyê Anton Stimber, pispora (mutexassis) mafên mirov Sandaran Logie û assîstanê şandê Julian Bacetk pêk hati bû, kir. Amanca şandê piştgiriyê Encumena Civaka Sîvîl a Parlemeta Kurdistanê û ya NGOyan (Rêxistinên Ne Hukûmî), di çarçeva bernameyêke taybetî li Iraqê de, bû.
(peyamner.com, 10.10.2012)

UNAMI

Nimînendeyê hukûmeta kurdî ji bo karên derve, Fellah Mustafa, pêşwaziya yekîneya mafên mirov û nimînendeyê Kommiserê Bilind ê Mafên Mirov ê UNAMI, Francesco Motta, kir. Her du alî li ser mafên jinan û zarokan li Kurdistanê peyivîn û biryar stend ku hevkarîya di navbera KRG (Kurdistan Regional Gov-

ernment) û UNê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî) de bajon, ji bo bêtir pêşdebirina mafên mirov li Kurdistanê. Wan li ser rola girîng a perwerdê di vî warî de israrr kir.

(peyamner.com, 29.10.2012)

200 KARXANE DI 8 MEHAN DE

Birêvebirê plankirina pîşesaziyî (sina’î), Sirûd Ehmed, ji ajansa Peyamnêrê re daxuyand ku di 8 mehên dawîn de, ji 200 karxaneyên (fabrîka) cihê bêtir li navçeyên cihê yên Kurdistanê, bi sermayeya 125 milyar dînar, hatin ava kirin. Û wî got jî ku ewê ev yek bihêle ku ji 2.000 bêkar bêtir re kar bê dayîn.
(peyamner.com, 03.10.2012)

KURDISTAN LI KONFÊRANSA EREBÎ YA NAVNETEWYÎ LI FRANSA

Di 11 Çirî 2012 de, berpirsiyarê pêwendiyên derve yê hukûmeta Kurdistanê Iraqê, Fellah Mustafa, li Konfêransa Navneteweyî ya Cihana Erebî, ku ji aliyê Enstituya Cihana Erebî li Parîsê hat pêk anîn, peyivî. Wî tê de rewşa nuha ya Kurdistanê, di warê ramyariyî, aborî û civakî de, ravekir.

Piştî konfêransê, Mustafa li Saraya Elysée ji aliyê Emmanuel Bonne, rawêjkarê (muşawir) serokê Fransa ji bo karên Rojhilata Navîn, û ji aliyê şandeke wezaretê fransî ya karên derve, hat pêşwazî kirin.

Wezîrê kurd ê çandê û cuhanan, Kawa Mehmûd Şakir, û nimînendeyê hukûmeta Kurdistanê Iraqê li Fransa, Xaman Zrar Esed, hogiriya wezîr Mustafa di vê seredanê de kir.
(peyamner.com, 12.10.2012)

KONGREYA CIHANÎ YA KURDÎ

Di 12 Çirî 2012 de, Kongreya Cihanî ya Kurdî li Hewlêrê, li bin patronaja serokê Kurdistanê Iraqê Mesûd Berzanî, û bi amadebûna wezîrê plankirinê Elî Sindî, wezîrê perwerdeya bilind û lêgerîna zanyariyî Elî Seîd Muhemmed, wezîrê çandinê Sîrwan Baban û berpirsiyarê karên derve yên Kurdistanê, wezîr Fellah Mustafa, dest pê kir. Pispor û ronakbîrên kurd ku li welatên cihê yên biyanî dijîn hatin vexwendin (dawet kirin), ji bo ku ji lêgerîn û tecrubeyên wan ên di warên tendurustî (saxî), çandin, perwerde, geşt (tûrîsm), arkêolojî, pêşdebirina imaknên mirovî ... kelk (feyde) bê stendin.

Di roja 2mîn de, lêgerên (researchers, chercheurs) cihê lêgerînên xwe pêşkêş kirin : Mehdî Berzencî, ku li Danemarkê dijî, lêgerîna xwe li ser dermanan pêşkêş

kir. Suleyman Sahibî li ser çêkirina kanalan (canalisations) li Kurdistanê di sedsala 21mîn de pêşkêş kir. Elî Behrem, ku li Swêdê dijî, tecrubeya Çîn û Bengladêşê di berhevanîna şîr de. Manuel Maturîk û Îgor Borîzer bi hev re lêgerîneke bi navê "Hefteya Sipî", li ser pêşdebirina bajaran, pêşkêş kir. Lêgerînên din li ser perwerdeya bilind, bingeha aborî, serdestiya êlêktronîkê, xizmetên giştî ... hatin pêşkêş kirin.

(Çapemeniya kurdî, 13.10.2012)

8mîn FWARA NAVNETEWYÎ YA HEWLÊRÊ

Di 16 Çirî 2012 de, 8mîn Fwara Navneteweyî ya Hewlêrê ji aliyê wezîrê kurd ê bazarganî û pîşesaziyê, Sinan Çelebî, hat vekirin. 850 şirket ji 23 welatan beşdarî wê bûn. Wî bala beşdarî kuşand pêşveçûna aborî ya Kurdistanê : Berê bitenê 7 salan, hatina neteweyî ya "brut" ji bo kesekî 300 dolar bû. Nuha ew bilind bûye 6.000 dolar. Û wî got jî ku ew hêvî dike ku di 10 salên wêbê de ew bigihêje 10.000 dolar.

(peyamner.com, 17.10.2012)

EXXON MOBIL XWE JI IRAQÊ DIKÎŞÎNE Û BITENÊ LI KURDISTANÊ DIMÎNE

Li gora malpera entêrnêtê ya amerîkî Petroleum-Economist, mezintîrîn şirketa amerîkî ya pêtrol û gazê, Exxon Mobile, xwe bicarek ji Başûrê Iraqê kişand û bicarek li 6 ciyên "site" lêgerîna pêtrolê li Kurdistanê bi cî bû (bi mehan, hukûmeta Bexdadê rexneya Exxon Mobile dikir, ji bo ku wê li Kurdistanê bê destûra "îzn" vê hukûmetê kar dikir. Buroya Kurdî).

(peyamner.com, rizgari.org, 19.10.2012)

ŞIRKETEKE ALMANÎ YA ÊLÊKTRÎKÊ LI KURDISTANÊ

Di 17 Çirî 2012 de, wezaretê êlêktrîkê ya Kurdistanê Iraqê bi şirketa almanî ya êlêktrîkê, Siemens, re kontrateke 70 milyon dolar wajo (imza) kir, ji bo avakirina 3 navendên belavkirina êlêktrîkê li parêzgehên (wilayet) Hewlêr, Suleymaniyê û Duhokê. Ewê ev proje 4 salan bajo (dewam bike). Di dema wajokirina kontratê de, wezîrê kurd ê êlêktrîkê, Yasîn Ebûbekir Mawetî, got ku nuha hêza berhevanîna (capacité de production) êlêktrîkê li Kurdistanê 2.700 MW e û ku di 2016 de ewê bigihêje 6.000 MW.

(nefel.com, 20.10.2012)

KURDISTANA SÛRIYÊ

RAGIRTIN Û KUŞTINA KURDAN

Kurdek li Helebê tê kuştin

Di 28 Îlon 2012 de, Reşîd Hebîb, endamê Yekîneya Parastina Gel (YPG), li bingehêke çavdêriyê (control), li taxa kurdî ya Helebê, Şêx Meqsûd, hat kuştin. Ew di navbera berên (gulle) alîgirên rejîma sûrî û endamên dijberiyê (muxalefet), Leşkerê Azad ê Sûrî, de çikiya bû.

(kurdwatch.org, 10.10.2012)

Kurdek li Deyr El-Zorê tê kuştin

Di 28 Îlon de, cuhanekî kurd, Abdulqadir Elî Muhammed, li Deyr El-Zorê, dema ku wî xizmeta leşkerî dikir, di pevçûneke di navbera leşkerê rejîmê û yê dijberiyê de, hat kuştin.

(avestakurd.net, 09.10.2012)

Leşkerê Azad ê Sûrî bombeyekê li Qamişlî diteqîne : 6 mirî û 81 birîndar

Di 30 Îlon de, Leşkerê Azad ê Sûrî (dijberiya sûrî ya erebî ya çekdar) bombeyek li Qamişlî teqand. 6 kes hatin kuştin û 81 birîndar kirin. Partiyên ramyariyê (siyasî) yê kurdî ev êrîş tawanbar (mehkûm) kir.

(rudaw.net, avestakurd.net, 02.10.2012)

Kurdek li Hesiçê tê kuştin

Di 30 Îlon de, dema ku Ra'd Muhammed Beşo tevî endamên malba xwe li balkona mala xwe, li Hesiçê, rûniştî bû, merivekî li ser motosiklêtekê agir berda wî. Ew li nexweşxanê mir. Beşo endamê Tevgera Gelê Kurdistanê li Sûriyê, rêxistineke nuh a cuhanan, bû.

(kurdwatch.org, 05.10.2012)

2 zarok tînan kuştin û 12 kesên mezzîn li Helebê tînan birîndar kirin

Di 30 Îlon de, rokêt li ser taxa kurdî ya Helebê, Şêx Meqsûd, ketin. 2 zarok hatin kuştin û 12 kes birîndar kirin.

(kurdwatch.org, 21.10.2012)

Du kes tînan ragirtin

Di 03 Çirî de, hêzên ewlehiyê yê sûrî Abrurrahman Xalid û Rascal Tamr Yaqûb li Zorava (bi erebî : Wadî El-Meşarî'), taxeke kurdî li nêzikî Şamê, ragirtin. Xalid ji berê jî, di 05 Adar de, tevî 3 kurrên xwe û birayên Yaqûb, hati bû ragirtin. Sedemên van ragirtinan ne naskirî ne.

(kurdwatch.org, 17.10.2012)

4 birêvebirên Encumena Neteweyî ya Kurdî tèn bin çav kirin

Abdulmecîd Temer, endamê encumena birêvebir a Encumena Neteweyî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS), ji aliyê kesên nenas, tevî 3 hogirên xwe, dema ku ew ji Kurdistana Iraqê vedigeriyên, hatin bin çav kirin. (rudaw.net, 06.10.2012)

8 Kurd li sînorê lubnanî tèn kuştin û 7 jî tèn birîndar kirin

Di 10 Çirî de, karwaneke karkerên kurd ku ji Lubnanê vedigeriyên li Şiyê hatin êrîş kirin. 8 mirin û 7 jî birîndar bûn. (netkurd.com, 12.10.2012)

4 mirî û 2 birîndar li Helebê

Di 16 Çirî de, bombeyek li taxa kurdî ya Helebê, Şêx Meqsûd, teqiya. 4 sîvîl mirin û 2 jî birîndar bûn. (avestakurd.net, 16.10.2012)

Kurdek têt revandin

Di 16 Çirî de, Yekîtiya Cuhânên Kurd li Sûriyê daxuyand (îlan kir) ku Azad Muhammed Eta, ji bajarê Dêrikê, ji aliyê komeke kesên rûgirtî û nenas hat revandin. (avestakurd.net, 18.10.2012)

2 kuştî li As-Sabinah

Di 20 Çirî de, leşkerê sûrî rokêtek avêt ser gundê As-Sabinah, li Başûrê Şamê. 2 Kurd hatin kuştin. (kurdwatch.org, 29.10.2012)

ÊRÎŞÊN FIROKEYÊN SÛRÎ

Di 20 Îlon 2012 de, hêzên ezmanî yên sûrî gundê Eyn Îsa, li Başûrê Kobanî, ku tê de nemaze Erebb dimînin, bombe kir. 27 kes, ku ji wan Kurdek, hatin kuştin. (kurdwatch.org, 07.10.2012)

Di 05 Çirî de, firokeyên sûrî erebyeke ku tê de Kurd hebûn û ku ji Helebê diçû Efrînê bombe kir. 3 kes mirin û 7, ku ji wan 2 zarok, birîndar bûn. (rudaw.net, avestakurd.net, 05.10.2012)

Di 09 Çirî de, otobusek li ser rîya Efrîn-Helebê, li nêzikî gundê Heyanê, hat bombe kirin. 4 Kurd mirin û 7 jî birîndar bûn. (rudaw.net, avestakurd.net, 09.10.2012)

Di 05 û 09 Çirî de, 7 kes ji aliyê hêzên ezmanî yên sûrî, li nêzikî Adana, li Bakurê Helebê, hatin kuştin. (kurdwatch.org, 21.10.2012)

Di 15 Çirî de, otobuseke ku ji Efrînê diçû Helebê hat bombe kirin. 5 Kurd, ku ji wan jinek, hatin kuştin. (rudaw.net, avestakurd.net, 15.10.2012)

Di 17 Çirî de, Edîb Abdurrahman Mella Suleyman, endamê Partiya Dêmkokratîk a Kurd a Pêşverû li Sûriyê, û 2 kurrên xwe li Kobanî, di ereba xwe de hatin bombe kirin. Her sê bi giranî birîndar bûn. Piştî bav mir. (kurdwatch.org, 24.10.2012)

LEŞKERÊ TIRKÎ ÊRÎŞÎ “PYD”ê DIKE

Di 02 Çirî 2012 de, leşkerê tirkî êrîşî endamên “PYD”ê, şaxa sûrî ya PKKê, li nêzikî Dirbêsiyyê, li Kurdistana Sûriyê, kir. 1 mir û 3 birîndar bûn. (rudaw.net, avestakurd.net, 02.10.2012)

Di 02 Çirî de, dergevanên sînorî yên tirk endamêkî PYDê kuşt û 2 jî birîndar kirin. (kurdwatch.org, 16.10.2012)

LEŞKERÊ SÛRÎ ÊRÎŞÎ KURDISTANA TIRKIYÊ DIKE

Di 03 Çirî 2012 de, navçeya Açakale, li nêzikî Urfa, li Kurdistana Tirkîyê, ji Tel Abyad, nêzikî bajarê sûrî Raqqa, hat bombe kirin. 5 kes, ku ji wan jinek û 4 zarok, mirin û 19 jî birîndar bûn. Hukûmeta tirkî bi bombekirina çend bingehên leşkerî li Idlibê (ne li Kurdistanê) bersîv da. Sûriyê ji bo êrîşa leşkerê xwe ji Tirkîyê bexişandin (efû) xwest. (rudaw.net, avestakurd.net, nefel.com, 03 û 04.10.2012)

DIBISTANÊN KURDÎ LI KURDISTANÊ

Li piraniya bajarên Kurdistana Sûriyê fêrên zimanê kurdî û ala kurdî hene. Bepirsîyarên wezaretê sûrî ya perwerdeya neteweyî mamosteyên kurd bi birrîna mûçeyên (meaş) wan tehdîd dikin. (rudaw.net, 03.10.2012)

PYD ÊRÎŞÎ XWEPÊŞANDIYÊN KURD DIKE

Di 28 Îlon û 19 Çirî 2012 de, xwepêşandan (meşîn) li bajarên cihê yên Kurdistanê bûn. (kurdwatch.org, 06.10.2012)

Di 07 Çirî de, Yekîneya Parastina Gel, ku girêdayî partiya kurdî PYDê (şaxa PKKê yê sûrî) ye, êrîşî xwepêşandanekê ku li Dêrikê ji aliyê komên cihê yên cuhanan, ji bo bîranîna kuştina kesahiya kurd Meş’el Temo hati bû pêk anîn, kir (PYD bi kuştina wî tê gûman «şubhe» kirin). Yek ji van pêşandîyan ji malpera Kurdwatch re got ku endamên vê koma PYDê ruyên wan girtî bûn û di destê wan de darên hesinî hebûn, û ku li wan xist, destgehên wan ên deng (microphone ...) têk dan (xerab kirin) û ala kurdî çirand û avêt erd. (kurdwatch.org, 13.10.2012)

PYD KURDAN DIREVÎNE

Zilamên çekdar ên partiya PYDê Behzad Dursin, endamê polîturoya Partiya Dêmkokrat a Kurd li Sûriyê, û Nidal Selîm, endamê heman partiyê revandin. Ev yek, dema ku her du bi erebê diçûn gundê Gurmîşê. Di 25 Çirî de, xwepêşandanek li Dêrikê, ji bo riswakirina (protêsto) vê kirinê, bû.

(rudaw.net, netkurd.com, rizgari.org, 26.10.2012)

Di 16 Çirî de, zilamên rûgirtî çalakvanê kurd Azad Muhammed ‘Ata li hemberî dibistanekê li Dêrikê revand. Sedemên vê revandinê ne naskirî ne. Ev bajar ji aliyê partiya kurdî PYDê hatiye çavdêrî (kontrol) kirin.

(kurdwatch.org, 28.10.2012)

PEVÇÛN DI NAVBERA PYDÊ Û LEŞKERÊ AZAD Ê SÛRÎ DE

Di 27 Îlon 2012 de, pevçûn di navbera yekîneya kurdî ya Selaheddînê Eyyûbî, ku girêdayî Leşkerê Azad ê Sûrî ye (dijberiya erebî ya çekdar), û PYDê, li gundê Îsko, li nêzîkî Efrînê, bû. Du endamên yekîneyê û endamekî PYDê hatin kuştin. Her alî yê din tawanbar kir.

(kurdwatch.org, 14.10.2012)

LEŞKERÊ AZAD Ê SÛRÎ LI HELEBÊ : 15 MIRÎ Û 25 BIRÎNDAR

Di 26 Çirî 2012 de, Leşkerê Azad ê Sûrî êrîşî taxa kurdî ya Helebê, Şêx Meqsûd, dema ku rûniştevanê wê xwe pêşan dida (dimeşiya), kir. Piştî vê yekê, leşkerê hukûmî tax bombe kir, ji bo ku Leşkerê Azad ê Sûrî jê biqewirîne. Piştê, “YPG” (zilamên çekdar ên PYDê) êrîş kir û xelkê her du taxên kurdî yê Helebê, Şêx Meqsûd û Eşrefiyê, xwe pêşan da. Vê carê, Leşkerê Azad ê Sûrî êrîşî xwepêşandiyan kir. Bi giştî, 15 mirin û ji 25 bêtir jî birîndar bûn.

(avestakurd.net, rizgari.org, 27.10.2012)

HEYFSTENDINA LEŞKERÊ AZAD LI EFRÎNÊ : 6 MIRÎ Û 7 BIRÎNDAR

Di 28 Çirî 2012 de, piştî pevçûnên Helebê (li jor binêre), komeke Leşkerê Azad ê Sûrî, ya bi navê “Ammar Dexînî”, xwest ku êrîşî gundê Kurdên yezîdî, Qestelê, li navçeya Efrînê, bike. Zilamên YPG (çekdarên PYDê) bersîv da. 6 kes ji koma erebî mirin û 5 jî birîndar bûn. Û 2 kes jî ji YPG birîndar bûn.

(avestakurd.net, 29.10.2012)

ALÎKARIYA KURDISTANA IRAQÊ

Ji 25 Îlon 2012 de, Encumena Piştigiriya Kurdên Sûriyê rojane quttiyên pere datînin Parka Hewlêrê û xelk pere dixwe nav wan, ji bo alîkarîkirina Kurdên Sûriyê.

(rudaw.net, 06.10.2012)

DESTEYA BILIND A KURDÊN SÛRIYÊ DIÇE SEREDANA TIRKIYÊ

Berdevkê Desteya Bilind a Kurdên Sûriyê, Ehmed Sulayman, tevî şandekê çû seredana şaredarê Diyarbekirê, Osman Baydemir. Evê dawîn ji wan re got ku li Rojhilata Navîn jiyana Kurdan re gelek zor e, ku li gel vê yekê, Kurd li dijî gelên din dernakevin, ku ew bitenê dixwazin ku bi azadî û keramet li ser axa xwe bijîn û ku heta ku Kurd azad nebin Rojhilata Navîn jî azad nabe.

(rizgari.org, 09.10.2012)

TIRKIYE PIŞTGIRIYA DESTEYA BILIND A KURDÎ DIKE

Di 08 Çirî 2012 de, berdevkê Desteya Bilind a Kurdên Sûriyê, Ehmed Suleyman, ji kanala têlêvîzyona erebî El-Arabiyya re daxuyand ku dema ku Kurdên Sûriyê di 06.08.2012 de li Kurdistanê Iraqê civiya bûn, ew tê de rastî wezîrê tirk ê karên derve, Ahmet Davutoğlu, bûn û ku wî ji wan re got ku hukûmeta tirkî Encumena Neteweyî ya Kurdî li Sûriyê weka nimînendeya (temsîlcî) gelê kurd li vî welatî dibîne, lê ku ew Desteya Bilind a Kurdî napejirîne (qebûl nake) ji bo ku tê de PYD (şaxa sûrî ya PKKê) jî heye.

(avestakurd.net, 09.10.2012)

Nîşank : Ev nav çî ne ?

- « **Desteya Bilind a Kurdî** (li Sûriyê) ji van destgehên ava bûye :
 1. « **Encumena Neteweyî ya Kurdî** » ku ji partiyên siyasî yê cîyê yê Kurdistanê Sûriyê, ku ne girêdayî PYDê ne, pêk hatiye.
 2. **PYD**, partiya Kurdistanê Sûriyê, ku girêdayî PKKê ye.
 - **PYD** « **Partiya Yekîtiya Dêmkokratîk** » partiyeke siyasî li Kurdistanê Sûriyê ye û girêdayî PKKê ye.
 - **PKK** « **Partiya Karkerên Kurdistan** » partiyeke siyasî li Kurdistanê Tirkiyê ye û ji 1984 de şerrekî çekdarî dike.
 - « **Leşkerê Azad ê Sûrî** » şaxa çekdar a Encumena Neteweyî ya Sûrî ye, lê tê de Kurd nîn in.
 - « **Encumena Neteweyî ya Sûrî** » ji partiyên dijberiyê (muxalefet) li Sûriyê, ji derveyî Kurdan, pêk hatiye.
-

CEZAYÊN YEKÎTIYA EWROPÎ

Di 15 Çirî 2012 de, wezîrên karên derve yê Yekîtiya Ewropî li Bruksêlê civiyan û tê de biryar stend ku ji firokeyên sûrî re hatina Ewropa qedexe bikin. Bi ser de jî, 181 kes û 54 rêxistinên sûrî hatin danîn lîsta reş a Yekîtiya Ewropî.

Berê rojekê, di 14 Çirî de, Tirkîyê jî biryar stendi bû ku nehêle ku firokeyên sûrî li ezmanê wê bifirrin. (nefel.com, 15.10.2012)

KONFÊRANSEKE KURDÎ LI PARÎSÊ

Konfêranseke Kurdên Sûriyê li parlamenta fransî li Parîsê bû. Beşdar ji Desteya Bilind a Kurdî, partiya PYDê, Encumena Neteweyî ya Kurdî û partiya Kurdî Yekîtiyê bûn. Ramiyar û dîplomatên ewropî jî tê de peyivîn. (rudaw.net, 19.10.2012)

ŞANDÊ TAYBETÎ YÊ « UN »Ê RASTÎ KURDAN TÊ

Şandê taybetî yê UNê li Sûriyê, Axdar Ibrahîmî, li Şamê rastî şandeke Encumena Neteweyî ya Kurdî li Sûriyê hat. Ibrahîmî bixwe ev rasthatin xwesti bû, ji bo ku helwesta hemî aliyên dijberiya sûrî nas bike. Şandeya kurdî jê re got ku Kurd hilweşana rejîma Esed û avakirina Sûriyêke dîmokratîk û nenavendî (décentralisée), ku tê de mafên gelê kurd li gora peymanên navneteweyî

bên dabîn (te'mîn) kirin, dixwazin. (rudaw.net, nefel.com, rizgari.org, 23.10.2012)

RASTHATIN BI SEROKÊ KURDISTANA IRAQÊ RE

Di 23 Çirî 2012 de, serokê Kurdistanê Iraqê, Mesûd Berzanî, pêşwaziya şandeke Desteya Bilind a Kurdî li Sûriyê kir. Wî jê re piştgiriya xwe ji Kurdên Sûriyê re dubare (tekrar) kir û yekîtiya hemî partiyên ramyariyê yê wê perçeya Kurdistanê xwest. Her du alî rewşa penaberên (multecî) kurd ên Sûriyê li Kurdistanê Iraqê jî giftûgo (munaqeşe) kir. (peyamner.com, 24.10.2012)

DAXUYANIYÊN ENCUMENA NETEWAYÎ YA SÛRÎ

Serokê Encumena Neteweyî ya Sûrî, Abdulbasit Seyda (Kurd), got ku hêzên ewlehiyê ji navçeya kurdî derneketine û ku servîsên dîzî û polîs hîn jî xelk radigirin, nemaze li bajarên mezzin, weka Qamişlî û Hesicê. Li ser PYDê jî, wî got ku tu dîktatorî, ya Esed yan a Kurdan be, nayê pejirandin (qebûl kirin) û ji PYDê xwest ku bibe perçeyek ji şoreşê. Li ser pîrsa kurdî li Tirkîyê, wî daxuyand ku wî jî serokwezîrê tirk, Recep Tayyip Erdoğan, re got ku divê ku ev pîrs bi awakî dîmokratîk bê çare kirin. (avestakurd.net, 26.10.2012)

NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ LI CIHANÊ

XELATÊN NAVNETEWAYÎ JI FÎLMÊN KURDÎ RE

Li Ispanya

Di 27 Îlon 2012 de, filma « Demsala Kerkeden » (Rhino Season) (La Saison du Rhinoseros), a filmçêkerê navdar Behrem Qubadî, ji Kurdistanê Îranê, Xelata baştirîn fotografî li 60mîn Festivala Navneteweyî ya Fîlm li San Sebastian, li Ispanya, stend. Fotograf jî Kurdekî Îranê, Tûrec Eslanî, ye. Aktrîsa navdar Monica Bellucci jî di vê filmê de dilîze.

Ji berê, Qubadî xelatên cihê yê navneteweyî ji bo filmên xwe yê navdar, « Kîso jî dikarin bifirrin » û « Nîv-Hîv », stendi bûn. (peyamner.com, 01.10., avestakurd.net, 02.10.2012)

Li Mayorka, kurtefilma « Xaka Qehremanan », a filmçêker Sehîm Umer Xelîfe, Kurdekî Iraqê ku li Beljîka dijî, Xelata Taybetî ya Jurî stend. Heta nuha, ev film beşdar bû 100 fêstivalên sînema û 18 xelat stendin.

(peyamner.com, 30.10.2012)

Li Lubnanê

Di 11 Çirî 2012 de, filma « Bîsîklêt » a Rizgar Huseyn, ji Kurdistanê Iraqê, Xelata Zêrîn « Gold Aleph » a baştirîn kurtefilma Rojhilata Navîn, li 12mîn Fêstivala Navneteweyî ya Fîlm li Beyrûtê, stend. (peyamner.com, 14.10.2012)

Li Amerîka

Fîlma « Şeqama Dr. Qasimlû » (şeqam = kuçeya fireh), a filmçêkerê ji Kurdistanê Îranê, Fethî Mîrzayîyan, Xelata Taybetî ya Rexnegiran, li Fêstivala Navneteweyî ya New Yorkê, Gotham Screen International Festival « GSIFF », stend (Dr. Abrurrahman Qasimlû sekreterê giştî yê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê Îranê bû. Ew li Viyenna, li Otrîşê « Nêmsa » ji aliyê « diplomatên » rejîma îranî, ku pê re li ser otonomiya Kurdan li Îranê giftûbêj dikir, hat kuştin). (rudaw.net, 29.10.2012)

3 XELATÊN SWÊDÎ JI NIVÎSKAREKÎ KURTEÇÎROKAN RE

Erkan Esed, nivîskarekî kurd ê cuhan ê kurteçîrokan, Xelata Radyoya Swêdî, ku her sal ji nivîskarekî re tê dayîn, stend. Ew ji Kerkûkê, ji Kurdîstana Iraqê ye û ji 3 saliya xwe de li Swêdê dijî. Pirtûk li ser zewacên bi zorê ye û navê wê bi swêdî « Gift Mot Sin Vilja » ye. Ji berê jî, di 2012 de, vê pirtûkê Xelata Baştirîn Nivîskarê Biyanî li Swêdê stendi bû. Di 2011 de, Xelata Baştirîn Pirtûk li ser Wekheviya Zayend (cins) û Netewahiyan stendi bû.

Esed ev xelata dawîn baştir dît, ji bo ku ew ji aliyê xelk hat dayîn û ku ev yek nîşan dide ku piraniya xwendevanên swêdî dengê xwe da wî.

(rudaw.net, 20.10.2012)

KURD LI KONGREYA NIVÎSKARAN LI KOREYA BAŞÛR

Ji 10 heta 15 Îlon 2012, Yekîtiya Nivîskarên Kurd « PEN-KURD » beşdar bû 78mîn kongreya rêxistina navneteweyî ya nivîskaran, PEN-International, li Gyeongju, li Koreya Başûr. Kongre bi beşdarbûna 300 nivîskarên ji 143 şaxên cihê li 102 welatan li cihanê bû. Babeta sereke « Wêje, Media û Mafên Mirov » (wêje : edebiyat) bû. Banû Bêrîvan Doskî û Abdullah Hicab, endamê encumena birêbeber a PEN-KURDê, beşdarî wê bûn. Sê ji daxuyaniyên wan ji aliyê kongrê hatin peji-randin. Ew li ser zîndankirina nivîskar û rojnamevanên kurd li Tirkiyê û tezyîqên li ser jinên kurd bûn.

(rudaw.net, 02.10.2012)

ROJA NAVNETEWYÎ YA MUZÎKÊ LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 01 Çirî 2012 de, bi hinceta (munasebet) Roja Navneteweyî ya Muzîkê, Fêstivalek li Hewlêrê ji aliyê wezareta çand û cuhanan hat pêk anîn. Orkêstra senfonîk a Kurdistanê fêstival vekir. Piştî, Koma Keçan a bajarê Suleymaniyê konsêrek pêşkêş kir. Û li dawiyê semînerê hat pêk anîn.

Roja Navneteweyî ya Muzîkê her sal ji 01 Çirî 1975 de, piştî banga serokê IMCê, Yehudi Menuhim, tê pîroz kirin.

(rudaw.net, 02.10.2012)

LI ERMENISTANÊ PERWERDEYA ZIMANÊ KURDÎ BI TÎPÊN LATÎNÎ

Ji 1941 de, Kurdên ku li Ermenistanê dijîn zimanê xwe bi tîpên (herf) kîrîlîk, li dibistanên fermî (resmî) hîn dibin. Piştî daxwaziyan ku salên dirêj ajot, hukûmeta ermenî li dawiyê, di 2010 de, peji-rand (qebûl kir) ku Kurd alfabe ya latînî bi kar bînin. Di 2012 de, fondeke (pere) taybetî ji dibistanan re, li navçeya kurdî Elegezê, hat dayîn. Pirtûk ji aliyê helbestvanê kurd Elîxanê Memê hatin amade kirin.

Di merasîma vekirinê de, serokê Encumena Kurdên Ermenistanê « Şêwra Kurdên Ermenistanê », Kinyazê Hemîd, û ronakbîrên din ên kurd axaftin li ser vê babetê kirin.

(rudaw.net, 06.12.2012)

RADYOYA KURDÎ LI GURCISTANÊ

Ayni Bahar, Kurdekî yezîdî ku li Gurcistanê dijî, radyoya kurdî ya vê komarê bi rê ve dibe. Li radyoyê ew bi navê « Bela Sturki » yan « Bahar Sturki » hatiye nasîn. Ev radyo di 29 Îlon 1978 de bi awakî fermî hati bû vekirin û nivîskarê kurd Keremê Angoşî tê de 15 xulek (deqqe) di rojê de weşan dikir. Li gel astengên teknîkî û kêmbûna karkeran, Kurdên Gurcistanê xebitîn ku ev radio bi awakî daîmî biweşîne. Di wê demê de, fêrên zimanê kurdî li dibistanan nîn bûn û radyo dikari bû ferzend bide wan ku zimanê xwe ji bîr nekin. Piştî hilweşana Yekîtiya Sovyêtî di 1990 de, ev radyo diviya ku raweste, ji bo ku Kurd rojên zor dijîyan. Bitenê di 2007 de, di dema Şoreşa Pembe a Gurcistanê de, ew ji nuh de hat vekirin. Nuha navê wê « Rûnakî » ye, ji hukûmeta gurcî alîkariya maddî (subsides) distîne û bitenê 15 xulek dajo. Di van xulekan de nûçeyên Gurcistanê û agahdarî li ser çand û dîroka kurdî tîpên pêşkêş kirin. Meriv dikare di heftê de carekê li ser FM 100.9 û malpera www.kurd.ge guhdariya wê bike.

(rudaw.net, 07.10.2012)

PÊŞANGEHEKE ZAROKAN LI SER DU ERDHEJÊN WANÊ

Ji bo bîranîna her du erdhejên ku di 232 Çirî û 09 Teşrîn 2011 de li Wanê, li Kurdîstana Tirkiyê bûn, pêşangeheke wêneyan (resm) a zarokan li vî bajarî, bi piştgiyariya jimareke mezzin ji rêxistin û şaredariyan, hat pêk anîn. 250 zarokên ji 18 salî kêmtir 10 hefteyan fêrên wênekêşiyê stendin û piştî 214 tablo di vê pêşangehê de pêşkêş kirin. Ozan Yurdalan, hunermendê filmên belgeyî, got ku amanca vê pêşangehê ew bû ku alîkarîkirina zarokan bê kirin ku «trotatîsm» a xwe, ku ji sedema van erdhejan bû, derbas bikin.

(rudaw.net, 07.10.2012)

DÊFÎLEYÊN CILLÊN KURDÎ LI ALMANYA Û HOLLANDA

Inci Hakbilen jina kurd a pêşîn e ku li Ewropa dêfîleyên cillên kurdî pêk tîne. Heta nuha, wê 4 dêfîle li Hamburg, Nurenburg, Dortmund, û li Hollanda, pêk anîn.

(rudaw.net, 08.10.2012)


HEWLÊR PAYTEXTA TÛRÎSTÎK A WELATÊN EREBÎ DI 2014 DE

Di 16 Çirî 2012 de, li Qahirê, li Misrê, yariyek (yarîş, musabaqa, concours) ji bo destnîşandana paytexta tûrîstîk (a geşt û guzarî) a welatên erebî di 2014 de bû. Hewlêr (Erbil), paytexta Kurdîstana Iraqê, tê de bi ser ket.

Parêzgarê (walî) Hewlêrê, Newzad Hadî, di konfêranseke çapemeniyê de daxuyand ku li yariyeke li Iraqê di 2011 de, ev bajar weka namzedê (candidate) yariya Qahirê hati bû dest nîşan dan. Di vê yariya dawîn de, filmeke belgeyî (documentaire) li ser Hewlêrê hat nîşan dan. Hin xalên (mercên, şertên) ku ji bo karkirinê hatin xwestin ev bûn : jimara otêl û motêlan, rewşa ewlehiyê (emniyet), ciyên dîrokî, başbûna riyân ...

Yarî ji aliyê 7 endamên buroya tenfizî a wezaretên tûrîsmê yê 22 welatên erebî hati bû pêk anîn.
(peyamner.com, rudaw.net, 17.10.2012)

ALFABEYA KEVNAR A KURDÎ



Piştî lêgerînên (lêkolîn, recherches) dirêj, nivîskarê ji Kurdistanê Iraqê, Wûsîf Zozanî, gotarek li ser alfabeya kevnar a kurdî, bi sernivîsa “Ziman û Alfabeya Kurdî” weşand. Ew tê de dibêje ku heta hatina Islamê, Kurd bi vê alfabeyê dinivîsî. Piştî vegirtinên islamî ji aliyê Erebî, Kurdan dest bi nivîsîna bi tîpên (herf) erebî kir (nuha, bitenê Kurdên Iraq û Îranê bi tîpên erebî dinivîsin. Ên din, ji salên 1930-1940 de bi tîpên latînî dinivîsin. Buroya Kurdî).

(netkur.com, 20.10.2012)

95.000 TÛRÎST CÊJNA QURBANÊ LI KURDISTANA IRAQÊ DERBAS DIKIN

Encumena Tûrîsmê ya hukûmeta Kurdistanê Iraqê daxuyand ku di 4 rojên cêjna qurbanê de, ji 95.000 tûrîst (geştîyar) bêtir hatin seredana Kurdistanê. Piraniya wan ji navend û başûrê Iraqê, û yê din ji Îran û Tirkîyê hatin. Ji wan, 44.000 hatin seredana Hewlêrê, 17.000 Suleymaniyê, 22.000 Duhokê û 1.200 Germiyanê.

(peyamner.com, 29.10.2012)

